ADAR 2026

KURMANCÎ

# BAJAR






KEKO




QEHREMANÊN MEHÊ
CALVIN Û HOBBES

KA KÎ YE EV
YILMAZ GÜNEY?



ŞAREDARIYA BAJARÊ MEZIN A AMEDÊ



HER GEL DIVÊ BIKARE ZIMANÊ XWE
HÎN BIBE Û BIDE HÎNKIRIN. MAFÊ PERWERDEYA BI
ZIMANÊ DAYIKÊ JIXWE VÊ ÎFADE DIKE.

HETA EV MAFÊN KU KURD JÊ HATINE MEHRÛMKIRIN
BÊN WERGIRTIN, YEK JI RÊYÊN PARASTINA ZIMÊN
JÎ HUNER E. EW TIŞTÊ KU EM HEWL DIDIN BI
STRANAN, BI BERHEMÊN ŞANO Û
SÎNEMAYÊ BIKIN, ÎRO EM DIXWAZIN BI VÊ KOVARA
XÊZ Û XÊZEÇÎROKAN JÎ LÊ ZÊDE BIKIN Û EM
DIBÊJIN, KEREM BIKIN EV HÛN EV E BAJAR.

EV KOVARA KU EM BI MEBESTA
HÎNBÛNA XWENDIN Û NIVÎSÎNA BI KURDÎ Û PRA-
TÎZEKIRINA VÊ YEKÊ DERDIXIN, HER WISAN EM
DIXWAZIN DESTEKÊ LI HUNERA XÊZAN BIKIN.

ŞAREDARIYA BAJARÊ MEZIN A AMEDÊ



BAJAR ADAR 2026




## KEKO
LI DIYARBEKIRÊ ROLA ZORÊ




KA KÎ YE EV
## YILMAZ GÜNEY



## MEHLÛQATÊN EŞREF




## CALVIN Û HOBBES
HAYDÊ EM DERKEVIN KEŞFÊ




## HEŞT AGIRÊN ADARÊ



## QEHREMANÊ KUÇEYÊN TENG



Doğan Güzel
KEKO
'LI DÎYARBEKIRÊ ROLA ZORÊ'
EXXXK! EV ÇI YE ÎCAR REMEZAN, SAAFÎ ÇAYA TIRK?
QET ŞIKAYET MEKE KEKO, EM NIKARIN HER CAR ÇAYA SAFÎ QAÇAX ÇÊKIN. ÇENGEK QAÇAX, SÊ ÇENG JÎ YA RÎZEYÊ... EGER NE QAYÎL Î JÎ OXIRA TE YA XÊRÊ BE!
UF KEKO LO, JI BO CÎXAREYEKÊ NIKARIM HERÎM DIKANÊ, EZ JI XWE RE SMÎTÊN XWE DIFROŞIM. HER KES WEK TE NE BETAL E Û KES JÎ NE XULAMÊ TE YE.
ÇAWA ÇAWA?!.. ÛLA EV ÇI YE ÎCAR!
HELA! ÇI BI VÎ MILETÎ HATIYE?
ÇAWAAA ?!...
JIXWE ME JI BERÊ DE DIGOT; DEMA SÎLEHAN QEDÎYAYE ÊDÎ. DI SEDSALA BÎST Û YEKÊ DE MERÎV RÊBAZÊN KEVN BI KAR BÎNE NABE.
EM Ê BI RÊYÊN BÊŞIDET LI HEQÊN XWE BIGERIN KU, BILA DINYA JI ME HEZ BIKE
MAMOSTA, EZ JÎ TEVÎ TE DIBÎM
ÛLA HÛN JÎ SIYASET ZANIN, KERÊN XWEDÊ! HER TIŞTÎ JI QÛNÊ FÊM KIRINE Û BI SER DE JÎ RADIBIN MAMOSTA MAMOSTA XEBER DIDIN. DU HEBÊN KURMÎ GEVEZETÎ DIKIN Û YÊ GURÎ JÎ TEVÎ HER TIŞTÎ DIBE.
TE.. TE GO ÇI?!..
ÇAWA ?!..
QEŞMER!
ÛLA SERSERÎ! DE ÎCAR BIXWE!
LÊXÊ MAMOSTA !
GRUM!
ZRÎNG!
EHM, ÇAYA QAÇAX A HEQÎQÎ JI BO KEKO... ÇAYDANA BIÇÛK HER TIM JI BO TE WÊ AMADE BE. NOŞÎCAN ...
PIÇEK ZEHMET BÛ LÊ HEWCE YE DI VAN DEMÊN TEVLIHEV DE, JI XELKÊ ME RE RÊYA RAST BIDIN NÎŞANDAN. HÎN KOTEK XWAR LÊ XUYA BÛ KU LI BAJÊR ROLA ZORÊ HÎN WEK BERÊ YE. ÛF, REHET BÛM.
JI KEKO RE CIXAREEE! ÇAWA BI TENÊ ÇÛ SER HERSÊYAN KEKÊ MIN. TU DIBÊJÎ QEY SUPERQEHREMAN... ÊDÎ EZ HEYRANÊ TEME.


Doğan Güzel
KÛTO
MALA DAWET Û CENAZEYAN
TOLÎ LÎ LÎ!
KA EM PIÇEKÎ KÊFA BIÇÛKAN BÎNIN.
HAHO, PEREYÊ NE SEXTE...
MIR MIR!... EL FAAATÎHE!
..SMÎLA.. REHMAN Û REHÎM...
BRAVO BRAVO! HOSTAYÊ KOÇEKÊ
FÎGURÊN KEVN, TEKNÎKÊN MODERN. SUPER!
...LAAAHÛ EKBER!...
SERÇAVÊN MIN KÛTO. XWEDÊ XÊRA TE QEBÛL BIKE.
KEVOK IM LÊ LÊ LÊ! HÎMQ! LÊ LAY!..
KEKO MÊZE JI MASEYA ZAVA ÇI JI ME RE ŞANDIN.
TI-LÎ-LÎÎÎ! ZÛ ÇETO, ARAQÊ VALA BIKIN TASIKÊN QARTON. BILA XALTIYÊN ME YÊN CINS ACIZ NEBIN.
ÛLA EV ÇI HALÊ TE YE ARAQXURÊ BÊNAMÛS! SAET ÇEND E, VEDIGERÎ MALA XWE, SERSERÎ!...
HMMM, XUYA YE KU EV PARVEKIRINA KARAN BAŞ NAŞIXULE. EW QAS CENAZE Û ŞÎNÎ LI SER KAREKTERA KÛTO TERS TESÎR DIKE. QURREYÊ SIYASÎ JI DAWETÊN SALONAN HEZ NAKE KU ÇENDEKÊ NOBETÊ BIDIM WÎ.
HEM BÊHNA JEHRÊ JÊ TÊ HEM JÎ BERSIV DIDE. KUÇEGERÊ BEREDAYÎ, VEGERE KUÇEYÊN XWE!
ÎCAR EV ÇI ADET E KU ZLAMÊN MALÊ DAWET Û ŞÎNÎYAN DI NAV XWE DE PAR DIKIN? TU DIBÊJÎ QEY KARÊN BIMEAŞ DIKIN. HER DU HERIN HER DUYAN NABE? WERE XANIM, CEHENIMA WAN KIRÎ. BILA SERSERÎYAN HEV BIXWIN.



ka kî ye ev?


## YILMAZ GÜNEY



## CALVIN û HOBBES

haydê em derkevin keşfê

## Mam Cici


KA KÎ YE EV?
YILMAZ GÜNEY
Mam Cici
Xwe wekî zarokê malbateke gundî ya bêerd û bi eslê xwe kurd dide naskirin Yılmaz Guney, li gundê *Yeniceyê* yê *Edeneyê* ji dayik bûye.
ÇIII!? KURD, BÊERD Û GUNDÎ? NALET LÊ BE!
Ji neh saliya xwe ve di gelek karên cuda de dixebite. Karê wî yê dawî li *Edeneyê*, ji bo sînemayekê daliqandina afîşên fîlman dibe.
AAA? FÎLMÊ KÊ YE EV?
yılmaz güney
Umut
EV AFÎŞA FÎLMA MIN E KU EZ Ê DI DAHATIYÊ DE ÇÊKIM.
Kovareke hunerê ya bi navê Doruk derdixe. Ji ber çîroka xwe ya bi navê *Sîstemên Newekheviyên yên Sênenasî* (Üç Bilinmeyenli Eşitsizlik Sistemleri) ku di 18 saliya xwe de nivîsiye, lêpirsîn lê tê vekirin.
EV ÇI EV? TÊKILIYA VÊ BI MATEMATÎKÊ RE ÇI YE? JI BER KU TE XWÎNER XAPANDINE, EZ Ê LI DIJÎ TE DOZÊ VEKIM
Lîseyê li *Edeneyê* diqedîne. Pêşî dikeve *Fakulteya Hiqûqê ya Zanîngeha Enqereyê*. Di dawiya sala yekem de dev ji berdide û li Fakulteya Aboriyê ya Zanîngeha Stenbolê dest bi xwendinê dike.
MIN ÎRO YILO LI DIBISTANÊ NEDÎT?
DÎSA DERBASÎ DIBISTANEKE DIN BÛYE.
Ji nivîskarê navdar *Yaşar Kemal* re dibêje ku dixwaze bibe sînemager.. Yaşar Kemal jî wî bi derhênerê hosta *Atıf Yılmaz* re dide naskirin. Di fîlmê *Bu Vatanın Çocukları (Zarokên vî Welatî) de*, ya ku senaryoya wê *Yaşar Kemal* nivîsiye û *Atıf Yılmaz* derhênerî lê kiriye, wekî alîkarê derhêner û lîstikvan cih girtiye.
EZ Ê WÊJEYA TIRKÎ, SÎNEMAYA TIRKÎ JÎ EV HEVAL BI PÊŞ DE BIBE.
HELLAAA?!... EM HER SÊ JÎ NE KURD IN?
EV DÎYALOGÊ RAST E.
Di fîlmê *Alageyikê* de jî bi heman ekîbê re dixebite. Ji ber ku dadgeha wî dewam dike, li şûna paşnavê xwe yê *Pütün*, yekem car di vî fîlmî de paşnavê *Güney (Başûr)* bi kar tîne.
YEKÎ BI NAVÊ YILMAZ PÜTÜN LI VIR HEYE?
TE BERÇAVKA KEK YILMAZ ATIF DÎTIYE GELO?
Dadgeh bi encam dibe. Sal û nîvek cezayê giran û şeş meh jî bi cezayê mişextiyê tê girtin.
XWEDÊ TE XELAS KE!
HO HOO... TU YÊ HÊ PIR RAZÊYÎ!
KAXIZ Û QELEMEKÊ PEYDA BIKE.
Dîsa vedigere sînemayê. Di hevpeyvînekê de ku nivîskar û derhêner Tarık Dursun pê re kiribû, bi navê 'Qralê Kirêt' derdikeve holê.
LI SER MIN WISA XWEŞ BINIVÎSE KU KU, EZ BIBIM QRALÊ YEŞÎLÇAMÊ.
??? LÊ JIXWE QRALEKÎ YEŞÎLÇAMÊ HEYE
AYHAN IŞIK? ÎCAR KU EW XWEŞIK, EZ JÎ KIRÊT BIM?
EZ Ê JÎ BIBIM 'QRALÊ KIRÊT'

Karakterê 'Qralê Kirêt' ê ku wî afirand, pir hat ecibandin.




Fîlmê 'Hudutların Kanunu' ya ku wî senaryoya fîlm nivîsiye û tê de lîstiye, sê caran dikeve ber sansûrê û du caran jî tê qedexekirin. Ji bo ku fîlm ji sansûrê rizgar bibe, li şûna navê *Guney*, navê *Emin Dağ* ê ku di şîrketa fîlman de dixebitî, tê nivîsandin.




Yekem fîlmê ku wî derhêneriya wî jî kiriye 'Seyyit Han', di Festîvala Fîlman a Navneteweyî ya Berlînê de tê qebûlkirin; lê belê ji ber ku lijneya sansûrê destûr nade, fîlm nayê şandin.




Ew diçe leşkeriyê. Piştî vegera xwe, fîlmê 'Umut' (Hêvî) ya ku di sînemaya Tirkiyeyê de wekî destpêka serdema 'realîzmê polîtîk' tê qebûlkirin, kişand. Fîlma *Umut*, di 2yemîn *Festîvala Fîlman a Kozaya Zêrîn* a *Edeneyê* de di pênc beşên cuda de hêjayî xelatdayînê tê dîtin. Di *Festîvala Fîlman a Cannesê* de jî tê ecibandin..




Adara 1971ê. Derbeya leşkerî pêk tê. Ji ber ku kesên der heqê wan de lêgerîn heye, di mala xwe de xwe vedişêre, tê girtin. Pêşî tê sirgûnkirin, piştre 10 sal cezayê girtîgehê lê tê birîn.




Di Festîvala Kozaya Zêrîn de ji bo fîlma 'Baba' xelatên 'fîlma herî baş' û 'lîstikvanê herî baş' didin wî; lê belê piştre bi zextên siyasî xelatê jê distînin û didin *Cuneyt Arkın*. *Cuneyt Arkın* vê xelatê qebûl nake.





Bi efûya sala 1974an de derket, ji girtîgehê derdikeve. Di heman salê de, fîlma 'Arkadaş' temam dike.




Dema ku fîlma 'Endişe' dikişand, bi îdiaya ku dadgerek kuştiye tê girtin û tevî hemû îtîrazên wî, 19 sal cezayê girtîgehê lê tê birîn



Dema ku di girtîgehê de ye, kovara çand û hunerê ya bi navê 'Guney' derdixe. Kovar piştî hejmara 13emîn tê girtin. Romanên bi navê 'Hucrem', 'Salpa' û 'Sanık' dinivîsîne. Ji ber nivîsên wî doz lê tê vekirin ku bi giştî 100 sal cezayê girtîgehê tê xwastin.




Bi fîlmên 'Suru' û 'Dijmin' ku senaryoya wan wî nivîsîbûn û *Zeki Okten* derhêneriya wan kiribû; di *Festîvalên Fîlman ên Berlîn û Locarnoyê* de, xelatên wekî 'Leopara Zêrîn' û 'FIPRESCI' û gelek xelatên din ên navneteweyî bi dest xistin.





Senaryoya fîlmê 'Yol'ê dinivîsîne û derhêneriya wê dide *Şerîf Goren*. Ew texmîn dike ku fîlmê wî dê li Tirkiyeyê were qedexekirin, loma jî fîlm direvîne *Swîsreyê*




Piştî demekê, bi alîkariya hevalên xwe, ji girtîgeha nîvvekirî direve û derbasî *Swîsreyê* dibe.




Fîlmê xwe ji nû ve montaj dike û ji bo pêşbirka *Festîvala Fîlman a Cannesê* dişîne; li wir Xelata 'Palmiyeya Zêrîn' bi dest dixe.




Fîlmê wî yê dawî fîlmê 'Duvar' e; ku tê de behsa serhildana qawîşa zarokandike, ku dema di girtîgehê lê bibû şahid. Derhênerê navdar *Elia Kazan* di dema kişandina fîlm de tê serdana wî.




Bi tevî Cegerxwîn, Enstîtuya Kurdî ya Parîsê vedike ku armanca wê lêkolîn û bipêşxistina ziman û çanda Kurdî ye, ava dikin.




Ji ber nexweşiya pençeşêra mîdeyê a ku di dema girtîgehê de pê girtibû, di sala 1984an de gava hîn 47 salî bû, jiyana xwe ji dest dide û li Parîsê, di Goristana Père Lachaise de tê veşartin.



**Mam Cici nivîsand**




# Haydê Em Derkevin Keşfê

*Dema di hawirdorekê de behsa xêzkirin û karîkatûrê tê kirin, ez bêguman mijarê tînim ser Calvin û Hobbes. Bi taybetî kesekî ku wan nas neke hebe, ez pir şa dibim; ji ber ku ez dizanim hinekî din ez ê wî îqna bikim ku wan bixwîne û ez ê qehremanekî nû li qehremanên wî yên ku ji wan hez dike zêde bikim. Eger kesekî ku bibêje "min Calvin xwend û min jê hez nekir" hebe, ez êdî tu pirtûkan ji wî re pêşniyaz nakim. Kesekî wisa ya fama wî ya mîzahî kêm e, ya jî êdî zêde mezin bûye.*
*Ez ê agahiyên der barê Bill Watterson de, ku afirînerê xêzebanda Calvin and Hobbes e, herî dawî bibêjim. Pêşî em karakterê xêzê û cîhana wî nas bikin;*

*Navê Calvin, ji navê John Calvin tê ku yek ji teologên damezirîner ên protestantiyê ye. Ev îroniyeke mezin e; ji ber ku karakterê Calvin, tam berevajî vê, anarşîstek e ku vîna xwe ya azad heta dawiyê bi kar tîne. Calvin zarokekî şeş salî yê meraqdar, jîr û xwedî xeyalên bi hêz e. Ew qas ku, hevalê wî yê herî nêzîk pilingê wî yê pêlîstok Hobbes e, ku Calvin bawer dike ew zindî ye. Calvin tevî ku meraqdar e jî, piranî napirse "çima?"; ew zarokî wisan e ku dibêje "çima nebe?" ye. Ji ber vê yekê jî ji kirina tiştê ku cara pêşî tê bîra wî venakişe. Bi taybetî çalakiya ku bi xwe kêfxweş be, qet li encama wê nafikire. Em dikarin vê yekê ji ajotina kaşoka wî ya bilez a ku ber bi raserê zinarekî ve jî diçe, fam bikin.Dema dikeve ji êşa canê xwe bêhtir, li kêfa wexta ku li hewa ye difikire. Li dibistanê tembel, di lîstikê de hîperaktîf e. Otorîteyê red dike û ji tiştên ku otorîte li wî ferz dike, bi xweavêtina nava xeyalên xwe direve. Dema bi rewşên nexweş ên wekî guhdarîkirina mamosta, banyokirin yan jî xwarinên ku jê hez nake re rû bi rû dimîne, dikare veguhere dînozorekî an zombiyekî; dikare bi balonekê bigire û hilbibe esmanan; dikare qutiyekê veguhere makîneya demê yan jî makîneya klonkirinê û ji wir biçe her derê ku bixwaze, û heta dikare bibe Mirovê Fezayê Spiff û li Marsê bi afirandiyên biyanî re şer bike.*

*Wekî her zarokekî, pirsên Calvin jî hene ku ew pirs ji temenê wî nayên hêvîkirin. Xwendevan caman dikare Calvînê dû dîtina raqûnekî mirî li nav daran di nav diyalogên hisî û felsefî de bibîne. Bi taybetî di hewayên biberf û melankolîk de, dema bi kaşokê dişemite, em dikarin bibînin ku ew di diyalogên bi Hobbes re li ser temayên qencî û xerabî, xweza, jiyan, tenêbûn û mirinê nîqaşan dike.*

*Her çi qas zarokekî biçûk be jî, em dikarin li ser karakterê Calvin rexneya tîpolojiya mêrên maço, pirsgirêkdar û ezezok bibînin.*
*Bi taybetî têkilî û diyalogên ku bi hevala xwe ya polê Suzi re datîne, tam rexneyeke mêraniyê ye.*



**Calvin û Hobbes wêneromanek e ku di navbera 1985 û 1995an de ji aliyê Bill Watterson ve hatiye afirandin. Li seranserê cîhanê di zêdetirî 2400 rojnameyan de hatiye weşandin.**





*Her çi qas kêfa wî ji Suziyê re bê jî ew rola mêraniyê ya ku li xwe girtiye nahêle bi awayekî aşkera ev nîşan bide. Wekî kurikekî ê adetî eleqeya xwe ya der heqê wê de bi dehfdanê, bi çorsîtiyê nîşan dide. Pir balkêş e ku Suzî li şûna Calvin, bi Hobbes re çêtir li hev dike. Gelo çawa dibe ku Hobbes ji Calvin çêtir dizane ka keçik ji çi hez dikin? Gelo Hobbes versiyoneke Calvin a wêrektir û biaqiltir e? Detayeke din a xweş jî ew e ku, her çi qas di eynî emirî de bin jî Suzî dîkare bi jîrahiya xwe zora Calvîn bide. Calvin dikare bi aqilê xwe ji karakterê Mo yê kêmaqil -ku li dibistanê rê li ber wî dibre û jê haraçê dixwaze- rizgar bibe, lê gava dor tê ser Suziyê, ew vediguhere prîmatekî ku reftarên seretayî nîşan dide.*

*Navê karakterê Hobbes ji ramanwerê navdar Thomas Hobbes tê û alter egoya Calvin e. Çinkû di rastiyê de yê ku Hobbesê pilingê pêlîstok zindî dike, di hişê xwe de bi wî re diaxive û di her cure çalakiyê de wî dike hevalê rê, dîsa Calvin bi xwe ye. Hobbes versiyoneke wî ya bimentiqtir û rasyoneltir e. Bill Watterson di hevpeyvînekê de dibêje "Hobbes, bi qasî Calvin alter egoya min e jî."*

*Hobbes wekî qehremanên din ên xêzefîlman nayê mirovîkirin; her çi qas diaxive jî, bi tevger û gotinên xwe pilingbûna xwe bi xwendevanan dide hiskirin. Hobbes ji bo her kesî ji bilî Calvin, pilingekî pêlîstok e. Carinan serê mirov tevlihev jî dibe. Mesele, di serboriyeke wî de Hobbes winda dibe û em dibînin ku dêya Calvin bi qîrkirina navê Hobbes li wî digere da ku wî bibîne. Malbata Calvin*




*nûnerên çîna navîn a kevneşopî ye. Di malekê de dijîn ku baxçeyê wê yê paş li daristaneke piçûk dinêre. Bav, mirovekî henekçî ye ku di fîrmayeke patentê de dixebite û bi mîzaha xwe ya qerfî bersiva daxwaz û pirsên pûç ên Calvin dide. Mesela, di serpêhatiyekê de*




*Calvin ji bavê xwe dipirse ka çima wêneyên berêreş û spî ne. Bavê wî jî dibêje ku dinya berê reş û spî bû û paşê rengîn bûye.*

*Dema Bill Watterson Calvin afirand hîn nebûbû bav, lê di hevpeyvînekê de dibêje ku karakterê bavê Calvin têkeleke ji bavê wî û ji wî bi xwe ye. Dayik jî ji ber ku her gav neçar e Calvin kontrol bike, wekî fîgureke otorîteyê tê dîtin; lê em ji bîr nekin ku ji ber ku vegotin piranî ji perspektîfa Calvin tê avakirin, em nikarin bibêjin ku karakterên dê û bav bi awayekî objektîf tên nîşandan. mînak, eger dê û bav bi Calvin re mijûl nebin, hema bibêje qet xuya nakin. Ji ber vê yekê, her çi qas bi hev re bi dilovanî û bi qerfî biaxivin jî, em der barê rastiya têkiliya wan de zêde nabin xwedî fikir. Dîsan jî, tiştê ku bi xwendevanan tên hiskirin ev e ku ew hevjînê wisan in ku ji têkoşîna bi Calvin re westiyane û ji hev hez dikin.*

*Em bên ser afirînerê xêzebandê Bill Watterson. Zarokatiya vî xêzkarê hosta yê ku di sala 1958an de ji dayik bûye, li Ohioyê di taxeke gundewar de derbas dibe ku dişibe cihê Calvin lê dijî. Bi xwendina xêzeromanan û hewldana xêzkirinê mezin dibe. Pêşî di rojnameya zanîngehê de ku li wir zanistên siyasî dixwend, paşê jî di rojnameyeke herêmî de karîkatûrên siyasî xêz dike. Helbet ji ber ku ji kibriya hunerî ya edîtoran fam nake, tê derxistin. Piştî vê, ji fîrmaya reklamê veqete, ku neçar mabû lê bixebite û dest bi xêzkirina karîkatûrên polîtîk dike.*

*Di vê navberê de, ji bo afirandina karakterekî mîna Charles Peanuts û Pogo ya Walt Kelly ku heyranê wan bû, dest bi xebatê dike. Bi vî awayî Calvin and Hobbes diafirîne. Ji aliyê gelek weşanxaneyan ve tê redkirin ku serî li*

***Dema ew ji bo wan tiştên ku naxwaze tê neçarkirin, deriyên cîhana xeyalên xwe heta dawiyê vedike û ji wê dera ku lê ye dûr dikeve.***




***Dema ku ew bi pirsgirêkekê re rû bi rû dimîne û nikare pê re serî bike der, serî li mîzahê dide. Dibe ku bi vê yekê pirsgirêkê çareser nake, lê kêfxweşbûna wî garantî ye.***




*Xêzeke orîjînal a Calvin, bi şopên qelemzirîçê û bi sererastkirinên xwe ve.*

DEMA BERF HEBE MERIV DIKARE HERE ŞEMITOKÊ. DEMA BA HEBE MERIV DIKARE BAFIROKAN BIFIRÎNE. DEMA GERM HEBE MIROV DIKARE AVJENIYÊ BIKE.

LE DEMA BARAN BIBARE... PIF...

TENÊ SPOREK HEYE; DAYIKA XWE DÎN KIRIN.

wan dabû. Di dawiyê de, di 18ê mijdara 1985an de dest bi weşanê dike. Di sala yekem de di 35 rojnameyan de, di sala duyem de veduguhere rêzexêzeke wisa ku di 50 rojnameyan de bi hev re tê weşandin. Di dawiya sala duyem de pirtûka wî ya yekem dikeve nav lîsteya wan pirtûkan ku ew herî zêde tên firotin û bi zêdekirina serkeftin û navûdengê xwe 10 salan temam dike. Di dawiya 10 salan de, Calvin and Hobbes wekî karakterekî xêzeromanê derbasî nav rûpêln dîrokê dibe kuli  zêdetirî 2400 rojnameyan tê weşandin.

Dema di lûtkeya huner û navûdengê xwe de bû, tiştekî ku her kesî şaş dihêle dike û biryar dide ku Calvin and Hobbes biqedîne. Serbarê vê, li her derê dest ji xêzkirinê berdide. Dibêje ku ji ber bawer dike xêzebandê temenê xwe temam kiriye wî ev biryar girtiye û eger berdewam bike dê xera bibe. Ji bo Watterson, duristiya hunerî ji serkeftina bazirganî girîngtir e. Gava li wan xêzkaran ku xwe ji tekrarkirinê venadin û bi varyasyonên espiriyên berê  karakterê xwe didomînin dibînin, hirmeta mirov a ji Bill Watterson re careke din zêdetir dibe. Paşê tiştekî din dike ku mirov jê re heşmetkar dimîne; peymanekê hazir dike ku ji xeynî kitêbê wek berhemeke din firotina Calvin and Hobbes asteng dike. Wê rewşê di konferansekê de bi vî awayî aşkera dike:

"Xêzeromana min bi efsûna xeyalan û bi xwezaya taybetî ya hin hevaltiyan re têkildar e. Eger min zarokek û pilingê wî bi kar bianiya da bi firotina bibloyên biha yên ku tu kesî hewcedarî pê nîn e, baweriya kê dê bi bêgunehiya wan bihata?"

Ji wê rojê ve zêde xeber ji Watterson nehat girtin. Tenê çend hevpeyvîn pê re hatin kirin û çend karîkatûrên piştgiriyê xêz kirin. Tu carî nexwast ku wêneyê wî bê kişandin yan jî fîlmê wî bê girtin. Di çapemeniyê de tenê wêneyekî wî heye, ew jî di destpêka kariyera wî ya profesyonel de hatiye kişandin. Paşê tiştekî din ê ku heyranên wî pê şaşwaz nebûn kir û hemû xêzên xwe yên orîjînal û materyalên xwe bexşî Muzeya Pirtûkxaneya Xêzeromanê a Billy Ireland a Zanîngeha Ohio State kir.

Ew bû yek ji wan hunermendên ku bi qasî karakterê xwe yê afirandî ji alî xwendevanên xwe hat hezkirin û heyran man. Bi desenên xwe yên xarîqulade û bi sadebûna di xêzên xwe tesîr li gelek xêzkaran kir.







*Bill Watterson, 31ê Kanûna 1995an Roja Yekşemê dema ku xatir ji Calvin û Hobbes xwast, li pey xwe rûpelekî wiha çîl spî hişt. Tevî wan hemû salên ku derbas bûn, tu kesî nekarî cihê wî tijîbike. Dîsa jî... Rojekê bi ihtimalên mezin, dibe ku yên ku vê yekê pêk bînin di nav me de bin*






# QEHREMANÊ KUÇEYÊN TENG

Şêxmûs Çîçek


DIYARBEKIR. TAXA REZAN. DEMA KU QEHREMANÊ ME ŞÊXO KUÇEYA REŞ Û TARÎ YA TENG Û DIRÊJ LI PÊŞIYA XWE DÎT BÊHEMDÎ JI DEVÊ WÎ EV GOTIN DERKETIN
JAR TÊKEVÊ!
LÊ JI BER KU TÊRA XWE JÎR Û ZANA BÛ MESELE ZÛ FAM KIR.
JIXWE LEMBEYÊN KUÇÊ KÊM IN, BI SER DE MILETÊ ME YÊ ÇIKÛS JI BO KU FATÛREYÊ ZÊDE NEDE ELEKTIRÎKÊN KUÇEYÊ PÊ NAXIN.
XWE METIRSÎNE ŞÊXO. PIÇEK TARÎ ME JI RÊYA ME VENAGERÎNE NE?
ÇAWA?...
JI TE RE NE MESELE YE TABÎ. TU HULK Î, KA KÎ DIKARE BI TE. LÊ EZ BI VÎ HALÊ XWE BIKEVIM NAVA VÊ... VÊ... XWEDÊ ZANE KA ÇI HEYE Û ÇI TUNE YE DI NAV VÊ TARIYÊ DE
HMMM, RAST DIBÊJÎ
DIXWAZÎ DI RÊYA RONÎ YA CADEYÊ DE BIÇE Û SÊ QAT DERENGTIR BIGIHÎJE MALÊ Û BILA MALÎ HENEKÊ XWE BI TE BIKIN; ŞÊXOYÊ BIZDONEK NEWÊRE DI NAV KUÇEYAN DE WERE...
ERÊ, PAŞÊ JÎ BIBÊJIN BELA WAN FÎLM Û WÊNEROMANAN WISA BÛME, NE?
ERÊ ŞÊXO. MILET FAM NAKE...
WÎÎÎ! SPIDERMAN ?...
DIBÊJIN QEY TENÊ TIŞTÊ XERAB JI ME TÊ. GEDÊ VÎ ZEMANÎ JI BELA ME DERSÊN XWE NAŞIXULIN, JI ZIMANÊ XWE DÛR DIKEVIN, HEVALTIYÊ JI BÎR DIKIN Û JI TARIYÊ DITIRSIN.
LÊ DÎSA TU ZANÎ NE PÎREBOK NE JÎ ZOMBÎ ME NIKARIN BITIRSÎNIN, NE?
TU CAR PETER! KÎ BE BILA BE EM PES NAKIN


ERÊ, MIN BELESEBEB EW QAS FÎLM Û KITÊB XITIM NEKIRIN. DIZANIM ÎNSAN JI TIŞTÊ FAM NAKIN DITIRSIN, LÊ XÊRA WE Û FÎLMAN ÊDÎ PIR TIŞTÎ DIZANIM. GAVA MERIV TIŞTAN BIZANE TIRSA BÊSEBEP JÎ NAMÎNE. HAYDÊ ŞÊXO, BIMEŞE.
LÊ EV BORIYÊN AVÊ Û TARIYA KUÇÊ... TU DIBÊ QEY... WEK... WEK...
MA... MA MILET MANYAX E QEY VAN DÎWARÊN XWE DIKIN WEK DEVÊ CINAWIRAN? JAR TÊKEVE!
HER CIH BI TÊLDIRIKAN PÊÇANE... Û TU DIBÊJÎ QEY EV DIRIK NE... NE PIR NORMAL IN... HAHO!
HOP ŞÊXO. PANÎK TUNE.
TU JÎ ZANÎ KU TÊL BI XWE NIKARE HEREKET BIKE LÊ MÊJIYÊ TE WÊ DIDE HEREKETKIRIN. FÊM DIKÎ ŞÊXO? SÎSTEM BI MÊJIYÊ TE DILÎZE. JI BO KU EV TIŞT BI TE WEKÎ MIMKIN BE.
ROSCHACH !?...
SÎSTEM ŞÊXO, WER DIKE KU ÎNSANÊ TU NAS NAKÎ BI TE WEK DIJMIN XUYA DIKE. YEKÎ KU LI HEQÊ XWE DIGERE WEK TERORÎST, Ê DIN KU TENÊ QEŞMERIYAN DIKE WEK HUNERMEND... TU ÊDÎ BAWER DIKÎ KU CÎRANÊ TE DIXWAZE QIRIKA TE JÊ BIKE, DEWLETÊN DIN WÊ BOMBAYÊN ATOMÎK BIAVÊJIN YAN JÎ TÊLDIRIK KARIN HEREKET BIKIN.
HMMM, EZ NIZAM BAWER BIKIM KIM YAN NA. MIN DU CAR WATCHMEN XITIM KIR Û ÇEND CAR JÎ DI FÎLMÎ DE DÎT, LÊ HÎN JÎ FAM NAKIM NIZA EV ROSCHACH BAŞ E YAN XERAB E?



Û TU DI NAV ZEBANIYAN DE JÎ WERÎ DINYAYÊ, DEMA DOST Û HEVALÊN TE BAŞ BIN Û BAŞIYÊ NÎŞANÎ TE BIDIN, TU JÎ DIKARÎ BIBÎ MERIVEKÎ BAŞ Û ALÎKARIYA KESÊN DI BIN ZILMÊ DE BIKÎ. ŞÊXO, BAŞÎ Û XERABÎ DI DESTÊ TE DE YE.
HELLBOY!... TU JÎ BI ŞÎRETAN?...
NEQEDÎYA ŞÊXO, GUHDARÎ BIKE; HER ÇI QAS TU DI MALBATEKE FEQÎR DE Û WEK HESINKAR HATIBÎ DINYAYÊ JÎ, DEMA TU WÊREK BÎ Û PIR ANTREMANAN BIKÎ, TU JÎ DIKARÎ DEHAQÊ XWE BIKUJÎ Û BI XWE BIBÎ QRAL. WEK TU ZANÎ DÛ 845 MACERAYAN DAWIYA DAWÎ EZ JÎ BÛM QRAL. QRAL CONAN.
EZ GROOT
CONAN WEXTA ŞER DIKE JÎ PIR XEBER DIDE LÊ XÊRA XWEDÊ EV QEHREMAN NE WEK WE YE.
REQ! XWIRŞ!
OY BISMÎLA! EW... EW ÇI TIŞT E DI NAV ÇOPÊ DE HEREKET DIKE?
EHM, LI MIN BIBORIN, LÊ HÛN XEYALÊN MÊJIYÊ MIN IN, LÊ TIŞTÊN KU DI NAV ÇOPÊ DE HEREKET DIKIN, NA. KÛÇIKEKÎ HOV, PISÎKEKE MANYAQ AN JÎ MÛTANTEKÎ GOŞTXUR...
PANÎK MEKE ŞÊXO, HÊDÎ BIMEŞE
MIN JÎ TE GOT ÇI? BAZ MEDE!
GROGU, WÎ BIDE SEKINANDIN
HUMMM MMMM!
ÇI DIKÎ ŞÊXO! EW QAS DERS Û ŞÎRET LÊ TU DÎSA WEKÎ XWE DIKÎ...
ÛY HULK!



QIRRRÇ!
HIRRRX! HUWAAAA! ...LLLÎLAH!
OY BÎSMÎLA!
HIAAAAA!...
QUZILQURT!.. BIZDONEKÊ BEREDAYÎ! TU LI KU DERÊ MAY, KURÊ KERÊ! SÊ SAET E MALÎ LI BENDA NAN IN.
D..DAYÊ!
JI BER KU TU NEWÊRÎ XWE LI KUÇEYAN BIXÎ DÎSA DI RÊYA DIRÊJ DE HATÎ, NE? TIRSONEKÊ BEREDAYÎ, HINGÎ TU WAN FÎLM Û KITÊBÊN ŞEYTANOK DIXWÎNÎ, ÊDÎ TE MÊJIYÊ XWE XWARIYE. WELLE EZ Ê WAN KITÊBAN BIŞEWITÎNIM Û JI BAVÊ TE RE BIBÊJIM BILA TABLETÊ JI TE BISTÎNE
DÎSA TEWŞ MEWŞ XEBER DIDÎ PÎREKA CAHILA! Û HETA VÊ DERÊ JÎ DI NAV KUÇEYAN DE HATIM, TEMAM!
NE DERS DIŞIXULÎ NE JÎ DÊYA XWE Û BAVÊ XWE GUHDARÎ DIKÎ. AQÎLÊ TE HER TIM LI SER VAN ŞEYTANOKAN... HAHO, GEDÊ XELKÊ BIAQIL Û EFENDÎ NE, YÊ MIN DÎNÊ BEREDAYÎ DERKET. ŞÊXOOOO, EZ Ê BI TE ÇI BIKIM?...
ŞEYTANOK MEYTANOK, DÎSA JÎ JI TE BIAQILTIR IN, TEMAM! Û VA YE JI TE RE DIBÊJIM; KU KITÊBEKE MIN JÎ WINDA BE EZ TERKA MALA TE DIKIM. TE FAM KIR, PÎREKA BEREDAYÎ!
VAN GOTINAN JÎ JI WAN ŞEYTANOKAN HÎN BÛYÎ, NE! KURÊ KERÊ!
BES! TE NAN XWEST MIN NAN ANÎ. KA ŞÎVA TE? BIRÇÎ ME DAYÊ.
OFFF, NIKARÎM DERDÊ MEZINAN BIKIŞÎNIM. EZ ÇÛM
HMMM ?!
ROJNIVÎSKA ROSCHACH. SAL 2026. DIYARBEKIR.
ÎRO MIN DÎSA FAM KIR KU DÊ MEZIN QET NEGUHERIN. DÎSA ME WEK DIJMINÊ EXLAQÊ ZAROKÊN XWE DIBÎNIN. LÊ BELÊ NA, ÇI BIKIN BILA BIKIN EM Ê VAN GEDAN TENÊ DI DESTÊ WAN DE NEHÊLIN.
XALTÎ NEHEQÎYÊ LI ME DIKE, NE CONAN?
EZ GROOT



LI SER TE NIHA ÇI HEYE DELALÎKA MIN?

# XÊZ-ARŞÎV


No2
ZRÎNG!
KURMANCÎ
SUPRÎÎÎZ! VA YE HEJMARA DUYEMÎN...
GOGA
KURMANCÎ
THORGAL
ÎXANETA Û SERBAZ
pînê
TeWLo!



TIRŞIK
EŞREF MUMCU
LI BAXÊ MIN BÛ ZIVISTAN, HEY DÎLBERÊ DÊM GULISTAN... HIMM. GOTINEKE XWEŞ E, EZ BINIVÎSIM. TEYRO,
AAYY! YAW FEQÎ FEQÎÎÎ TE PIRÇ BI QÛNA MIN VE NEHIŞT. MA EZ QIRTASIYEYA TE ME LOO! TU YÊ BINIVÎSÎ, DI CÎHANÊ DE NAVÊ XWE BILIND BIKÎ Û TEYROYÊ REBEN JÎ BILA BI QÛNA TAZÎ BIGERE
YAW ÎRO DU ROJ E ZÎNÊ LI KÊLEKA MIN E NAÇE MALA BAVÊ XWE JÎ. TIRA MIN HATIYE BER DEVÊ QÛNA MIN JI ŞERMA NEWÊRIM BERDIM JÎ. A-HA WELE MIN BÊDENG BERDA
KÊ TIR KIR? EZ FETISÎM Û
TU DIBÊ QEY NE HESPÊ MIN E, YÊ DIJMIN E
BIRÊZ, EV DER RESTORANT E. HÛN ÇIMA ŞÎVÊ LI ERDÊ DIXWIN?
EM BI MALBATÎ JI XWARINA LI SER MASÊ HEZ NAKIN SIFREVANO. EM JI DÊ Û BAVÊ XWE WISA HÎN BÛNE. BI ME WISA XWEŞTIR E. QEY EYB E? NORMAL E WELE
MEŞLÛRE ABLA, GOYA XATÛN BI EVÎNEKE DÎROKÎ JI ZEMBÎLFIROŞ HEZ DIKE. TU DIBÎNÎ REBENO BÛYE EREBEYA BIN PÊYÊ XATÛNÊ. BI ŞEV Û BI ROJ WÊ DIGERÎNE. WEY MALA MINÊ
LI JÊR ERSEYA ERZAN HEYE. LI MILÊ ÇEPÊ DE XWE BERÎ JÊRÊ BIDE ZEMBÎLFIROŞ
SILO! KU EW HÊZÊN BIÇEK HATIN, EM Ê XWE ÎMHA BIKIN.
TU ÇI DIBÊJÎ REZO! MA QEY EV FÎLMÊ HOLYWOODÊ YE? KURO EM DIÇIN DIZIYA BAXÇEYÊ XALTIYA EMÎNEYÊ LO! EV GORÊ LI SERÊ ME JÎ GOREYÊN DÊYA ME NE
BELQITÎNO! HÛN BI ÇI DIKENIN, HÛN DÎSA LI SER DÎWARÊ ME ÇI XÊZ DIKIN. Ê DE VA EZ TÊM WE, NEREVIN
AAA
EV BAVÊ TE YÊ KUNDIR DÎSA ŞERAB VEXWARIYE SOSINÊ, LÊXE TÊRA WÎ LÊXE BILA HIŞÊ WÎ BÊ SERÊ WÎ
ZRÎÎÎNG


MEHLÛQATÊN EŞREF
MUNCU
AHA! DESTMALA SOR DIHEJÎNE. WEY MIN DI TELAQÊ TE Û BAVÊ TE... MIN BERDIN, MIN BERDIN EZ QILOÇÊ XWE BIÇIKÎNIM QÛNÊ
XWESÛYÊ TU ÎRO DEST Û PÊÇIYÊN XWE NEÊŞÎNE, MIN ŞÎV JI DERVE XWEST. JI KURMIK NOQTE QOMÊ
OOO ZAVAYO! WELE ÎCAR TU KETÎ ÇAVÊ MIN. XWEDÊ CIHÊ WÎ TIJÎ BIKE
KEK CEMBELÎ, DI PEVÇÛNEKÊ DE DERZIYA MIN ŞIKIYA. DOKTOR DERZIYEKE PROTEZ DA MIN. EZ Ê BI VÊ BI WAN VEDIM. LÊ GIRAN E HAA
ÊDÎ JI BO ZAROKAN JÎ BAR HEYE. ŞÎR BAR. WARÎLA ME JÎ ÇÊLEKA XALTIYA ŞÛŞANÊ YE...
LI SER TE NIHA ÇI HEYE DELALÎKA MIN?
TIŞTEK JÎ TUNE YE. ÇILPTAZÎ ME. EZ PIRÇIKANDIM Û WÊ MIN BIAVÊJIN FIRINÊ. BÊNAMÛSO TU DÎSA ÇÛYÎ BA KÎJAN ORISPIYÊ?
TU ÇIMA TÊYÎ MEHLA ME Û DÎKÊN MEHLÊ JI RÊ DERDIXÎ SUSLÎ XANIM! WELE EM MIRÎŞKÊN VÊ MEHLÊ HEMÛ BIBIN YEK Û EM Ê TE PIRTÎPIRTÎ BIKIN. BICEHIME ZÛ JI VÊ...
TU BIBELQITÎ CANO. TU BI QURBANA KURÊ XELKÊ BIBÎ. KU MÊVANEK BÊ CIHÊ RÛNIŞTINÊ TUNE DI MALA ME DE. TU LI MALA KOZO BINÊRE Û LI MALA ME BINÊRE. MALA WÎ EYNÎ SERAY E.
ODEYA MIN MÎNA ODEYA DAYIKA MIN NÎN BE JÎ ÎDARE DIKE KEKO. EV KEKÊ HANÊ KIRÊ MIRÊ JI MIN NASTÎNE. XWEDÊ EMRÊ WÎ DIRÊJ BIKE. ZILAMEKÎ BAŞ E
KENGÛRÛ


Ê DE HAYDÊÊÊÊ! HERE WERE TU YÊ NIFTIKEKÊ BIAVÊJÎ NAV...
EM VÊ LASTÎKÊ JÎ BIAVÊJIN NAV TEMAM E, WÊ HETA SIBEHÊ BIŞEWITE
ECELE... NIZAM HÎN EM Ê ÇEND HEB AGIRÊN NEWROZÊ PÊ BIXIN...
ÇEND HEB ?...
WAN WEXTAN LI WELÊT NEWROZ HATIBÛ JIBÎRKIRIN... HER WIHA WAN WEXTAN HIN MÊRXASAN JÎ JI BO NEYÊ JIBÎRKIRIN JI DESTÊ WAN ÇI DIHAT DIKIRIN...
HEŞT AGIRÊN ADARÊ
Şêxmûs Çiçek
ZRÎNG 2019
HEYLA BIKUTIM AGIRÊ BIHARÊ! LI VÎ GUNDÎ TENÊ ANARŞÎSTEK HEBÛ, EV TIŞT DIKIR. LÊ EW JÎ NIHA LI IZMIRÊ YE. ÊÊÊ... ÎCAR EV KÎ YE WÛLAN? NIHA EW HEMÎD PÊ DIZANE...
AGIR PÊ DIXIN QOMTANÊ MIN. AGIRÊ BIHARÊ...
RABE ÛLAN HEMÎD! TAM SERÊ HEFTEYEKÊ YE ME WEK QRALAN TU HEWANDÎ. ÎCA BÊJE, Ê KU EW AGIR PÊ XISTIN KÎ NE? BIBÊJE ÛLAN KÎ?...
AGIR!... TE GOT ÎRO AGIR PÊ XISTINE?
XWE LI NEZANIYÊ DANEYNE ÛLAN! TU NIZANIBÎ ÎCAR EW Ê KÎ ZANIBE!
IMXXX!... QOMTANÊ MIM HÛN JÎ TÊN Û DIÇIN DÎXIN STÛYÊ MIN
KA BIBÊJE NAVÊ WÎ ZAROKÊ BI TE RE DIÇÛ BAJÊR ÇI BÛ? LI KU YE? EW ZAROKÊ TE MÊJIYÊ WÎ ÇELIQANDIBÛ...
PEH, TU BEHSA REFÎQÊ EHMEQ DIKÎ... REBENO JI BER KU NEWÊRE BI TENA SERÊ XWE BIÇE TÊ CEM MIN
HAYDÊ EM DIÇIN MALA REFÎQ SOYDAN. EGER NE LI MALÊ BE, NEXWE WÎ AGIR PÊ XISTIYE.
QOMTANÊ MIN, AHA AGIREKÎ DIN JÎ...
HA-HAH!... EV BÛ DIDU!


NALET LÊ BE!... WELEH WÊ REFÎQOYÊ BIZDONEK NAVÊ HER KESÎ BIBÊJE. HEMA HETA SIBÊ REFÎQO NAVÊ KESÎ NEGOTA...
QOMITAN, AHA MALA REFÎQ... EGER AGIRÊ DÎDUYAN WÎ PÊ XÎSTIBE NE MIMKIN E HATIBE MALÊ Û EGER NE LI MALÊ BE TEQEZ EW E.
EV JÎ BÛ SISÊ!...
ÛLAN REFÎQ VA TU LI MALÊ YÎ, LÊ XWE VIR DE Û WIR DE NEBE Û NEBÊJE MIN XWE JÊ SAFÎ KIR.
TU TIM LI CEM HEMÎDÊ KURTÇÎ BÛYÎ...
HEMA QET SERÊ ME NEÊŞÎNE, NAVÊ XORTÊN KU AGIR PÊ XISTINE YEKO YEKO BÊJE.
HAYDÊ!...
T..TEMAM QOMTAN... EZ DIBÊJIM HEBE TUNE BE KURÊ MEZIN Ê MALA SALIHÊ ÇIYAYÎ SEYFEDÎNO YE...
VEKIN ÛLAN! EV DER NE MALA SEYFEDÎN E! DERÎ VEKIN...
TEQ! TEQ!
QOMTAN, ME LI NASNAMEYA WÎ MÊZE KIR, BERA JÎ EV SEYFEDÎN E. ÛLAN TE JÎ XWE BI XELASÊ XIST...
...Û FERHAD CAN JÎ QOMTANÊ MIN... EW JÎ PIR DIXWÎNE...
ÇÊBÛ FERHAD, TE XWE XELAS KIR EV CAR.
A..APÊ WÎ YÊ BIÇÛK HEMZE JÎ HEYE... QAFÊ WÎ JÎ EYNÎ QAFA YE...
ERÊ HEMZE VA TU JÎ LI MALA XWE YÎ... KA DESTÊ TE BÊHN BIKIM BÊ BÊHNA BENZÎNÊ JÊ TÊ YAN NA
ÇI?!...
BÊHNKIRINA ÇI LAN, Ê KU AGIR PÊ DIXE HER KÎ BE HÎN JÎ PÊ DIXE...
ÇAAAR!...
...Û MÛRADO JÎ HEYE QOMTANÊ MIN. MÛRADOYÊ KURÊ MUXTAR
VA ZAROK LI VIR E. BAŞ E... KA GAZÎ BAVÊ WÎ BIKIN


QOMTANÊ MIN MA Ê ÇI ÎŞÊ KURÊ MIN LI CEM VAN KURDÇIYAN HEBE. EZ BIM EZ Ê BIÇIM CEM MALA HUSÊN HELA BÊ LI MALÊ NE YAN NA...
HUSO ÛLAN KA WER EZ TE BÊHN BIKIM
S...SER SERAN QOMITAN
NEBÊJIN YASÎN BIÇÛK E. EW KURÊ RUSTEM HEYE YA KURÊ RUS...
BÊNAMÛSÊ MUXTAR GOT BIÇÛK E, LÊ NEGOT EV QASÎ BIÇÛK E
QO... QOMTAN ABÊ?!
HA HINDIK MABÛ MIN JI BÎR KIRA EW BEKIROYÊ BÊŞEREF JÎ HEYE.
ÛLAN BEKIR MA EV SAETA RAZANÊ YE, HE?!
HEEE... HIII.. HA?...
AHA BÛ HEŞT!
ULAN BELKÎ JÎ VÊ CARÊ ZILAMÊN LI ÇIYÊ KIRIBIN, HE?
EV JÎ LI MALÊ YE QOMTANÊ MIN
SIKTIR BE HERE. CAREKE DIN TE LI VAN DERAN NEBÎNIM
HATINA ÇI QOMTAN, TE EZ BELEHEQ GIRTIM. HAYA ME NE JI YÊN ÎSAL NE JÎ BI YÊN PAR HEYE. BELEHEQ TE EZ HEFTEYEKÊ RAGIRTIM
Ê KU EV KIRIBE XWEDÊ JÊ RAZÎ BE... HER KÎ BE Ê PAR JÎ JI SER MIN RAKIR...
KEKOOO !...
CANÊ !...
KEKO..
KEKO.. TU BERDAN...
ME DIZANIBÛ WÊ TE BERDIN XWIŞKÊ, MA NE?
MIFFF!.. MIFF!..
KEÇÊ DÎNÊ, MA EV BÊHNA BENZÎNÊ JI TE TÊ? KEÇÊ QEY WE?... HAHO WE ÇAWA... ÇAWA KIR?
XWIŞKÊ MIN JI GIŞTAN BAQILTIRE WELE...
SERÊ YÊN TE Û YÊN DEWLETÊ Û YÊN ÎSPIYONKERAN EYNÎ SERÎ YE. DESTÊ GIŞTAN BÊHN KIRIN, LÊ BÎR NEBIRIN LI DESTÊN ME MÊZE BIKIN. AQILÊ MÊRAN...
-HAHO, HÛN JIN ÇI ŞEYTAN IN...
-AHA, MÊZE VA KEREKÎ DIN JÎ...
XWEHA MIN WE AGIREK PÊ XISTA BES BÛ,
-ÎCAR ÇI HEWCEYÎ HEFTAN DIKIR?
-NE HEFT, HEŞT HEB BÛN.
-HEŞT? ÇIMA HEŞT?
-JI BO HEŞTÊ ADARÊ..
-HEŞTÊ ADARÊ ÇI YE KEÇÊ?
-HAHO BRAWO TU ÇI QAS CAHIL Î...
WAN ROJAN GELÊ ME NEWROZ JI BÎR KIRIBÛ...
Û JI XWE TU KESÎ BI HEŞTÊ ADARÊ NIZANIBÛ...




BAJAR

İmtiyaz Sahibi: Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Adına Zeynep Yaş Salam
Yazı İşleri ve İntiyaz Şahibi: Tahir Baykuşak
Editör: Doğan Güzel
Adres: Yenişehir Mah. İstasyon Cad. No 65 Yenişehir/Diyarbakır